Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :906 13-Cotmeh- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165


## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | P | A | N | O | ■ | T | ■ | A | E |
| 2 | ■ | R | A | ■ | C | Î | H | A | D |
| 3 | S | Î | ■ | P | ■ | R | E | ■ | E |
| 4 | S | ■ | M | A | L | ■ | D | A | N |
| 5 | ■ | P | ■ | T | ■ | N | Î | Ş | E |
| 6 | Z | Ê | M | A | R | ■ | S | Ê | ■ |
| 7 | I | R | A | ■ | O | F | ■ | F | A |
| 8 | R | ■ | K | Ê | M | A | R | ■ | S |
| 9 | X | E | ■ | L | A | L | ■ | T | A |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | ■ | | ■ | | | |
| 2 | | ■ | | | ■ | | | | |
| 3 | | | | | | ■ | | ■ | |
| 4 | | | | ■ | | | | | ■ |
| 5 | | ■ | | | | ■ | | | |
| 6 | | | ■ | | | | ■ | | |
| 7 | ■ | | | | | ■ | | | ■ |
| 8 | | | | ■ | | | | ■ | |
| 9 | ■ | | | | | ■ | | | |

### ÇEP-RAST

1. Alava ku datînin ser hespan û li serê siwar dibin... Rengê reşê dibiriqe
2. Baneşana keserê... Muxtar
3. (Ebdulsamet …) Li gorî lêkolînan kesê ku teksta herî pêşî a kurdî di salên 970'yî de nivîsiye.
4. Sedemkarê tevgerê, paldêr... Mehek
5. Notayek... Ji bo sekinandina ker, hesp û hêstiran
6. Cejin, eyd... Ji bo ajotina keran tê gotin... Pirç
7. Li gorî baweriya olî mirovê ku ewilî ji layê Xwedê ve hatiye afirandin û pêxemberê pêşî... Peyva neyînî
8. Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wekî sembola hêzê bi kar tînin... Ji vir û şûn ve, ji niha pê ve
9. Bajarekî me... Îrade

### JOR-JÊR

1. Peywirdarê dojehê
2. Zîl, ji kulîlkên nû vedibin re tê gotin... Parsûyên masiyan
3. Rê û kuçeya ku dawiya wê girtî ye... Edalet
4. Kurtebêja Ksenonê... Beşeke malê, jor
5. Mêrê ku temenê wî ji pênciyê derbas bûye
6. Kesê ku li ber aş dimîne û karê hêrana aşî dike... Ji bo dem û zeman, nîveka destpêk û qedanê
7. Baneşaneke gazîkirinê... Paytexta Îtalyayê
8. Sir, tiştê her kes pê nizane... Hevser (mêrê jinekê)... Rojek

## Quncika têgînan

| Bertek | Derketina li hemberê tiştekî, nerazîbûn: Li hemberî kiryarên wî bertek nîşan da. |
|---|---|
| Şênî | Yên li ciyekî ava dijîn: Şêniyên gund cejin pîroz dikirin. |
| Şênber | Tiştên ku mirov dikare destê xwe bide wan û bibîne. Melmûs: Weke kevir, av, dar... |
| Razber | Tiştên nayên girtin û dîtin. Tersê şênber: Weke heskirin, xemgînî... |
| Bîrdozî | Koma fikrên ku di warê siyasî, hiqûqî, zanistî, felsefî û dînî de rê didin ber tevgerên komekê, partiyekê yan rêveberiyekê. Îdeolojî. |
| Guncaw | Tişta bi kêr tê. Mûnasib: |
| Pêman/pêwan | Wesîle: Bi pêmana salvegerê şahiyek hat lidarxistin. |
| Hişmendî | Têgihiştin, zêhniyet: Hişmendiya wî ya derbarê jinan de ne rast e. |
| Vegirtin | Standina erdekî, milkekî bi darê zorê ji kesekî. Dagîrkirin: Welatê me vegirtin. Wateyên wê yên din jî hene. |
| Bişaftin | Helîna hêdî hêdî: Kevaniyê keşk bişaftin û dewê wan berda ser xwarinê. Herwiha bi mecazî tê wateya asîmîlebûnê jî: Civaka ne azad be tê bişaftin. |

# Panela bi navê 'Zarok û Ziman' hat lidarxistin

**MED-DER'ê panela bi navê "Zarok û Ziman" li dar xist. Di panelê de hat diyarkirin ku ziman ne tenê mafek e, ziman pêdiviyeke jiyanî ye.**




Komeleya Lêkolînê ya Ziman û Çanda Mezopotamyayê (MED-DER)' panela bi navê "Zarok û Ziman" li dar xist. Panela ku li avayiya komeleyê pêk hat gelek malbat û kesên zimanhez beşdar bûn. Herwiha pankarta "Parastina bi zimanê dayîkê mafekî bingehî ye" hat daleqandin. Moderatoriya panelê Hevseroka komeleyê Şîlan Elmas Kan kir. Wek beşdarvan jî pedagog Adar Jiyan, hiqûqnas Cemîle Turhalli, akademîsyen Resûl Geyîk tevlî panelê bûn.

Panel bi axaftina Şîlanê dest pê kir. Şîlanê diyar kir ku mafên zarokên Kurd bi sedê salan e tê binpêkirin û wiha got: "

Me kampanyayek dabû destpêkirin, ji bo ku zimanê kurdî bibe zimanê fermî û yê perwerdeyê. Em dizanin ku ziman ji gelek aliyan ve bandorê li zimanê heyî dike. Yên ku manewîyet û sibêroja vê civakê ava dikin bêguman zarok in. Lêbelê zarok ji mafên xwe yê bikaranîna ziman bêpar dimînin û bi tora bişaftinê re rûbirû dimînin. Bi taybetî jî li Tirkiyê ji ber pirsgirêka demokrasiyê mafê bikaranîna ziman tê binpêkirin. Li Tirkiyê bi qirkirinê çand û ziman tine tê hesibandin. Ji ber ku em li hemberî êrîşên li dijî zimanê kurdî bertekên hişk nîşan nadin nikarin pêşiya bişaftin û polîtikayên tên pêşxistin bigirin. Em dibêjin mafê zarokan yê ziman tê binpêkirin ji ber vê me xwest li ser vê mijarê panelê li dar bixin."

### 'Ziman bi nasnameya xwe civakê saz dike'

Parezêr Cemîle Turhalli jî axivî û diyar kir ku ziman ne axaftin tenê ye û wiha axivî: "Ziman çand, dîrok û hişmendiya kollektîva neolotîk e. Ziman bi nasnameya xwe civakê saz dike. Li ser erdnîgariya ku em dijîn êrîş û perçebûn heye. Ji ber wê, parçebûnê li ser zimanê kurdî jî bandor kiriye. Ziman ji bo neteweyekî gelek girîng e. Ji bo hişmendiya mirovan ziman gelek girîng e. Em her tim dibêjin ziman nasnameya me ye. Mirov bi nasnameya xwe tê naskirin. Netewe bi zimanê xwe tên naskirin. Ji ber wê em girîngiya ziman baş dizanin. "

### 'Tirkiye mafê zimanê zikmakî binpê dike'

Cemîle da zanîn ku ji bo mafê ziman komisyon û peymanên navneteweyî hene û axaftina xwe wiha domand: "Di nava peymanên navneteweyî de mafê ziman xal bi xal hatiye binavkirin. Li binê vê peymanê imzeya Tirkiye jî heye. Lêbelê Tirkiye mafê zimanê zikmakî binpê dike. UNESCO ji bo ku ji tevayiya zimanan re girîngî û rêzdarî bê nîşandan û pêşiya tinekirina zimanan bê girtin 21'ê Sibatê wek Roja Zimanê Zikmakî ya Cihanê îlan kir. Lêbelê Tirkiyê ew peyman imze nekir."

### 'Bikaranîna ziman ji bo perwerdeyê mafê bingehî ye'

Cemîle axaftina xwe wiha qedand: "Heta ku em zimanê xwe nedin jiyandin wê ziman jî mehkûmê tinebûnê be. Ji bo jiyandina ziman perwerde mafê bingehî ye. Ji ber wê em ji bo mafê perwerdeya ziman bi israr in. Divê qanûn li ser vê mijarê bên derxistin. Divê Tirkiye peymanên navneteweyî yên di hêla ziman de bibîne."

### 'Mafê perwerdeya zimanê zikmakî tine tê hesibandin'

Resûl Geyîk jî da xuyakirin ku mafê perwerdeyê ji bo zarokan girîng e lê perwerdeya bi zimanê zikmakî tine tê hesibandin. Resûl, wiha dirêjî da axaftina xwe: "Wextê ku zimanê zikmakî nebe, zimanê perwerdeyê, bi zanîna zimanê din pêş ve diçe û di dawiya dawî de zimanê zikmakî jî tê jibîrkirin. Bi vî awayî bi zarokan re hişmendiya ji bilî zimanê zikmakî pêş dikeve. Xwe pênasekirinê êdî bi zimanê din dike. Ji demên pêş ve êdî bikaranîna zimanê zikmakî kêm dibe, peyvên xwe kurt dikin û peyvên zimanê din dixin nava axaftina xwe. Vê gavê zarok bi hişmendiya zimanên serdest mezin dibin. Zarok piranî wextên xwe li dibistanan derbas dikin. Ji ber vê jî divê mafê perwerdeya bi zimanê zikmakî bê dayîn."

### 'Ziman pêdiviyeke jiyanî ye'


Pedagog Adar Jiyan jî diyar kir ku ziman ne tenê mefek e, ziman pêdiviyeke jiyanî ye û wiha got: "Çawa ku bê xwarin, bê henase jiyan nabe bê ziman jî jiyan ne pêkan e. Ji ber wê mafê ziman jî ji wan pêkeran ne cuda ye. Ji hêla pedagogan ve jî ziman weke dayîkê ye. Lewra dayîk parçeyek ji xwezayê ye û jê qut nabe. Ziman jî divê di xwezaya xwe de bimîne. Ji ber wê em ewqas li ser têkiliya zarok û ziman disekinin û nîqaş dikin. Em ji bo zarok û ziman dikarin şibandineke weke çêkirina avayiyekê bidin. Heke bingehê avayiyê tinebe, ew avayî mehkûmê ku hilweşe. Herwiha ziman kesayetê jî ava dike. Li ser derûniya zarokan bandora ziman rasterast heye. Zarokek ku zimanê xwe nikaribe fêr bibe helwestên dijwariyê nîşan dide. Lewra zarokên mafê wan yê ziman tê binpêkirin di hundirê wan de qelsî çêdibe. Ew jî xwe di demên pêş de bi şêwazên cuda nîşan dide. Di hêla derûniyê de zimanê dayşkê bi qasî şîrê dayîkê girîng e."

*JINHA*



## Yasemîna Sûriyê

Şehîd Hefrîn Xelef ne ji bo gelê Kurd tenê, ji bo azadiya gelên Sûriyê tevan dixebitî. Jixwe dewletên dagîrker yên mîna Tirkiyê, her tim jinên xwedîfikir û bihêz dikin hedefa xwe. Çimkî dixwazin hêviyên jinan bişkînin û wan weke demên berê bêdeng û bêmaf bikin. R-3



## Apê Osman

Helbestvan, zimanzan, nivîskar, rewşenbîr û ji pêşengên wêjeya kurdî ye. Kesayetêke Kurd yê navdar e. Ji 18 saliya xwe heta koça dawî ji bo parastina doza kurdî têkoşîn û xebat kir. Di têkoşîna xwe ya demdirêj de gelek êş û x-emgîniyan dikşîne. Ew kes helbestvanê Kurd Osman Sebrî ye û bi navê Apê Osman jî tê naskirin. R-7


Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 906 13-Cotmeh- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî


## "Emê heta dawiyê li dijî komplo û dagîrkeriyê têbikoşin"

Mihemed Şahîn: Qirkirin û êrîşên dagîrkeran yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê domandina komploya 9ê Cotmehê ya li ser Rêber Apo ne. Ji bo bêbandorkirina wê jî divê li her derê têkoşîn û berxwedan xurttir bibin. R-5

# LUC PAUWELS:
# PÊŞENGÊN ŞARİSTANİYÊ PÊŞİYÊN KURDAN İN

Luc Pauwels, di pirtûka xwe de dibêje, pêşiyên Kurdan li dinyayê cara pêşî li Mezopotamya li bajarê Ur'ê konfederasyona eşîran û pişt re şahtî-qraltî ava kirine. Herwiha diyar dike ku li Misrê cara pêşî ji aliyê pêşiyên Kurdan ve pîramît (ihram) hatine çêkirin. Yên destpêkê derbasî girava Brîtanyaya Mezin bûyîn, bi cî bûyîn û ji bo bicîbûna mirovan zemîn amade kirîn pêşiyên Kurdan in. Yên şerên Troya kirîn pêşiyên Kurdan in. Yên bajarê Romaya dîrokî ava kirîn pêşiyên Kurdan in. Şêniyên destpêkê yên paytexta Hollanda Amsterdam'ê pêşiyên Kurdan in. R-6




## `Emê çanda alîkariyê di nava civakê de belav bikin`

Pêngava Xwebexş ya Qamişlo, bi dirûşma 'Ez hes dikim alîkariyê bikim', ji gelek malbatên xizan û koçber re dibe alîkar. R-6





## Xelîfan ne cara yekê ye, kemînên PDK`ê dîrokî ne

R-4

## Li hemberî sansûrê berxwedan

Niştiman Erdede dibêje, xebata hunermendên hatîn sansûrkirin nîşana zora Tirkiyê ye. Pêşangeha 'Marîpişta Şkestî' ji bo ku hunermend bikarin careke din azadiya hizir û axaftinê bi dest bixin, tê lidarxisin. Em dixwazin ji bo wan warekî ava bikin, warekî azad. R-7






## QSD`ê derew û propagandeya reşkirinê ya dewleta tirkî eşkere kirin

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya QSD`ê, ragihand ku dewleta tirkî di çarçoveya hemleya reşkirinê ya ji bo nixumandina sûcên xwe yên li bakur û rojhilatê Sûriyê, wêne û dîmenên ne rast belav dike û çawa ku şervanên QSD`ê bin nîşan dide. R-2

# Li herêmên dagîrkirî revandina sivîlan dewam dike

**Çavkaniyeke herêmî ji gundewarê Kantona Girê Spî ragihand ku dagîrkeriya tirkî û çeteyên wê jineke ji bajarokê El-Elî Baceliyê revandin. Di nava kêmî mehekê de 4 jin ji heman bajarokî tên revandin.**

Li gorî çavkaniyê, panzêrên dewleta Tirkan ya dagîrker tevî çeteyên girêdayî wê bi ser bajarokê El-Elî Baceliyê yê Kantona Girê Spî de girtine û jina bi navê Uwêş Ehmed El-Uwêd ya ji eşîra El-Bo Esaf revandine.
Çavkaniyê diyar kir ku Uwêş ber bi şaxê têkoşîna li dijî terorê ya li navenda Kantona Girê Spî ya dagirkirî ve birin.
Ev jina çaran e ku di 21 rojê de ji aliyê dagîrkeran ve tê revandin. Ajansa nûçeyan Hawarê di 6`ê Cotmehê de revandina 2 jinên bi navên Zelxa El-Hisên û Fatime El-Giûd, belge kiribû.
Çeteyên Cebha El-Şamiyê yên girêdayî dewleta Tirkan ya dagîrker herwiha 19'ê Îlona borî li ser benda kontrolê ya Um El-Xeratîm ya nêzî bajarokê navborî, Kewser El-Ebid ya 18 salî revandibûn.
Ajansê herwiha revandina 6 jinên ji bajarokê Hemam Tirkmen û jinek ji bajarokê Silok belge kiribû. Jinên hatîn revandin ji eşîra El-Tirkmen, El-Bo Esaf, El-Ehwes û Teyî û eşîrên din yên herêmê ne.
Li gorî çavkaniyên xwecihî yên ji gundewarê Girê Spî, çeteyên dewleta Tirkan xwediyê dikana veguhestina pereyan yê bi navê Iyade El-Metriyan yê ji bajarokê Silokê jî revandine.
Ajansê berê diyar kiribû ku li nêzî gundê Erbîd yê girêdayî Silokê girtîgehek veşartî heye, çete kesên ku direvînin dibin wir û li hemberî berdana wan fidyeyê ji malbatên wan dixwazin.
FacebookTwitterWhatsAppTelegram
Li aliyê din çavkaniyeke ji Kantona Efrînê ya dagîrkirî ragihand ku çeteyên Ehrar El-Şerqiye, ji gundê Moseko û Hec Xelîl yên navçeya Raco du welatî revandin.
Li gorî çavkaniyê, navên kesên hatîn revandin wiha ne: Nezîr Mihemed Tobal ji gundê Hec Xelîl, Selah Osman Ekaş ji gundê Moseko.
Çavkaniyê ragihand ku çeteyan kesên revandî ber bi cihek ne diyar ve birine.
*ANHA*




## QSD`ê derew û propagandeya reşkirinê ya dewleta tirkî eşkere kirin

**Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya QSD`ê, ragihand ku dewleta tirkî di çarçoveya hemleya reşkirinê ya ji bo nixumandina sûcên xwe yên li bakur û rojhilatê Sûriyê, wêne û dîmenên ne rast belav dike û çawa ku şervanên QSD`ê bin nîşan dide.**

Berpirsê Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) Ferhad Şamî têkildarî hemleya reşkirinê ya dewleta tirkî ku wêne û dîmenên qaşo yên şervanên QSDê ne, belev dike, li ser malpera fermî ya QSD`ê daxuyaniyek belav kir.
Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Platformên çapemeniyê-istixbaratê yên dewleta Tirkan ya dagîrker wêne û dîmenên ne rast belav dike û di çarçoveya hemleya reşkirina hêzên me de, îdia dike ku ew dîmen girêdayî QSD`ê ne. Bi wê yekê dixwaze sûcên dagîrkirina xwe yên li herêmên ewle yên bakur û rojhilatê Sûriyê re binixumîne. Di wê çarçoveyê de, Wezareta Parastinê ya dewleta Tirkan li ser hesabê xwe yê twitterê di salvegera duduyan ya dagîrkirina Serê Kaniyê û Girê Spî de dîmenek ji bo propagandeya operasyonên xwe yên terorîstî li dijî hêzên me bi desteka Koalisyona Navneteweyî ji DAIŞ`ê rizgar kirine, belav kir. Wezaretê dîmenên topbarankirina hêzên hikumeta Şamê li dijî Helebê di sala 2016`an de belav kir û spart hêzên me. Ev yek di çarçoveya hemleyeke berfireh a reşkirinên de pêk hat."
Di dawiya daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Hemleya reşkirinê ya ku dewleta Tirk û çeteyên wê didin meşanidn, wê hewldanên me yên şopandina sûcdaran, rizgarkirina herêmên me yên dagirkirî û peydakirina vegereke ewle ji koçberan re asteng neke. Bi vê boneyê em bang li malper û platformên medya dijîtal û bi taybet twitter û facebookê dikin ku sînorekî ji van hemleyên reşkirinê yên dewleta Tirk re deynin û ji raya giştî re eşkere bikin."
Ferhad Şamî bi daxuyaniyê re lînka dîmenê ku Wezareta Berevaniyê ya Tirkiyê belav kiriye, her wiha lînkê dîmenê esasî yê di 2016`an de hatî belavkirin, parve kir.
*ANHA*

## Dagîrkeriya tirkî hêzên nû yên leşkerî dişîne gundewarê Idlibê



**Ser 100 wesaitî re yên dewleta tirkî ya dagîrker yên bi pêdiviyên leşkerî û lojîstîkê barkirî, di dergehê Kefer Lûsîn yê sînor yê li bakurê Idlibê re derbasî herêma bêçek bûn.**

Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan ya Sûriyê (SOHR) ragihand ku karwanekî nû yê girêdayî hêzên dewleta tirkî ya dagîrker derbasî herêma bêçek bû. SOHR`ê da zanîn ku zêdetirî 100 wesaitên bi pêdiviyên leşkerî û lojîstîkê barkirî di dergehê Kefer Lûsîn yê li ser sînorê Lîwa Iskenderûn ya bakurê Idlibê re derbasî herêma bêçek bûn û ber bi nuqteyên leşkerî yên dagîrkeriya tirkî yên li gundewarên başûrê Idlibê ve bi rê ketin.
Bi vê yekê re, piştî daxuyaniyên têkildarî Idlibê yên di navbera Rûsya û Tirkiyê yên di dawiya Îlona borî de û heta niha, zêdetirî 225 wesait û kamyonên leşkerî yên bi çekên giran barkirî derbasî herêma bêçek bûne.
*ANHA*

## Endamên Kongreya Star li Sêmalka li dijî kiryarên PDK`ê xwepêşandanek li dar xistin

***Endamên Kongreya Star di çarçoveya çalakiya xwepêşandanê ya li dergehê Sêmalka li dijî kiryarên PDK`ê tê lidarxistin de, li pêşiya pira Sêmalka xwepêşandanek li dar xistin û banga radestkirina cenazeyên gerîlayan kirin.***

Bi hezaran endamên Kongreya Star û endamên Desteya Aborî ji bajar û navçeyên her du kantonên herêma Cizîrê ber bi konê xwepêşandanê ve herikîn, ku Meclisa Malbatên Şehîdan a herêma Cizîrê li qada dergehê Sêmalka li dar dixe. Xwepêşandêran kiryarên Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) şermezar kirin û daxwaziya radestkirina cenazeyên gerîlayên di kemîna li Xelîfanê de şehîd bûyîn, kirin. Herwiha ji malbata şehîd Tolhildan û şehîd Serdem re sersaxî xwestin.
Endamên Kongreya Star li pêşiya pira di navbera Rojava û başûrê Kurdistanê de dike, xwepêşandanek li dar xistin.
Xwepêşandêran wêneyên şehîdan, al û sembolên kurdî hildan û sloganên ku kiryarên PDK'ê şermezar dikin, avêtin. Herwiha xwepêşandêran berê xwe dan konê çalakiyê.
Berdevka Kongreya Star a Rojava Remziyê Mihemed axivî û behsa berxwedana dîrokî ya hêzên gerîla kir. Remziyê diyar kir ku gerîla zarokên gelê Kurdistanê ne û armanca wan ew e ku rûmeta gelan û pêkhateyên herêmê, biparêzin.
Remziyê da zanîn ku konê xwepêşandanê li dergeha Sêmalka wê heta radestkirina cenazeyên şehîdên kemîna Xelîfanê, dewam bike. Herwiha bang li PDK'ê kir ku li xwe vegere û dev ji dijmantiya xwe ya li hembrî Tevgera Rizgariya Kurdistanê berde.
Remziyê di dawiya axaftina xwe de banga bilindkirina têkoşînê li hember dijiminên gel kir.
*ANHA*



## Dagîrkeran li Til Temir dêrek hilweşand û êrişî dibistan, goristan û navenda kehrebeyê kirin




**Artêşa tirkî ya dagîrker û çeteyên wê li gundê Til Cûma yê Asuriyan yê Til Temirê dibistanek, goristanek û navenda veguhestina kehrebeyê kirin hedef. Dêra gund hilweşiya.**

Ev demek e gundê Til Cûma yê Asuriyan yê li rojavayê navenda navçeya Til Temir bi dijwarî ji aliyê artêşa tirkî ya dagîrker û çeteyên wê ve tê topbarankirin.
ANHA'yê xwe gihand gund û ziyanên ji ber topbaranê çêbûyîn, şopandin.
Di topbaranê de, dibistan, goristan û navenda veguhestina kehrebeyê rasterast bûne hedef û ziyan gihiştiye wan. Herwiha ji ber topbaranê dêra gund hilweşiyaye.
Ev dibistana 5'an e ku li gundewarê Til Temir dibe hedefa hêzên dagîrker.
Bi van êrişan dewleta tirkî sûcên şer dike. Herwiha bi êrişa ser goristanên gundê Til Şenan û Til Cûma sûcê li dijî mirovayiyê dike.
*ANHA*



# *Apê Osman*

**Helbestvan, zimanzan, nivîskar, rewşenbîr û ji pêşengên wêjeya kurdî ye. Kesayetêke Kurd yê navdar e. Ji 18 saliya xwe heta koça dawî ji bo parastina doza kurdî têkoşîn û xebat kir. Di têkoşîna xwe ya demdirêj de gelek êş û xemgîniyan dikşîne. Ew kes helbestvanê Kurd Osman Sebrî ye û bi navê Apê Osman jî tê naskirin.**

**Hediya HISÊN-Qamişlo**



Osman Sebrî di sala 1905an de, li gundê Narangiyê yê girêdayî bajarê Semsûrê, li bakurê Kurdistanê, ji dayîk dibe. Li dibistanên Amedê dixwîne lê xwendina xwe nadomîne. Bi temenekî piçûk dizewice û sê zarok jê re çêdibin. Lê jin û du zarokên wî jiyana xwe ji dest didin. Lawikê wî yê sisiyan di çil û heft saliya xwe de tê kuştin û navê wî Walat e. Osman Sebrî dîsa dizewice û sê kurên wî çêdibin (Hoşenk, Hoşîn, Heval) û du keç (Hankur, Hêvî), herwiha keça birayê xwe ya bi navê Koyî xwedî dike. Digel ku bavê wî axayê eşîra Merdîsa bû, lê ji navê axa û serok hes nedikir. Bi navê Apo û Apê Osman dihat naskirin
Sala 1925an ew û malbata xwe tevlî şoreşa Şêx Seîdê Pîran dibe. Sala 1926an mîtên Tirkan wî û du apên wî digirin. Her du apên wî Şikrî û Nûrî hatin darvekirin. Lê Osman Sebrî du salan di zindana Denzli de dimîne û sala 1928 de tê berdan. Darvekirina apê wî bandorê lê dike. Ji ber wê ew û birayê xwe Bedir Osman Paşa yê ku kesê sereke di sedema darvekirina apên wî bû kuştin. Bi 26 axayên eşîrên Kurdan ji aliyê dewleta tirkî ve hat girtin. Sala 1929an ji Tirkiyê reviya Sûriyê û li Şamê bi cî dibe. Ji ber ku di wê demê de Sûriyê ji aliyê Frnsa ve hatibû dagîrkirin, fransiyan jê xwestin ku li gorî berjewndiyên wan yên siyasî li Şamê tev bigere, lê wî qebûl nekir û got, ez ji bo berjewendiyên netewweya xwe ya Kurd dixebitim. Destpêka salên siyan de tevlî Komela Xoybûn bû û di nava rêzên wê de çalakiyeke siyasî ya berbiçav nîşan da û li seranserê Kurdistanê geriya da ku bi pêkhateyên neteweperwer yên Kurd re têkiliyên neteweyî û rêxistinî bike. Bi Ihsan Nûrî Paşa re derdasî bakurê Kurdistanê bû da ku alîkariya şoreşgeran li çiyayê Agirî bike. Neçar bû ku li gel eşîra Iniz ya ku li ser sînorê Sûriyê û Tirkî ye xwe veşêre. Piştre çû başûrê Kurdistanê heta gihişt çiyayê Barzan.
Di Gulana 1931ê de ji ber helwestên xwe yê siyasî li Bexdayê tê girtin. Piştre derbasî rojhilatê Kurdistanê bû têkilî bi şoreşgeran re danî. Di nava wan de jî Qadî Mûhemed bû. Li rojhilatê Kurdistanê demekê dimîne û vedigere Şamê. Ji ber helwestên xwe fransî wî sala 1936an sirgûnî Filistînê dikin û sala 1937an dibin rojhilatê Afrîka (Medegeşqer)
Osman Sebrî yek ji edîtorên kovara Hawar bû, ku sala 1942yan ji aliyê Mîr Celadet Bedirxan ve li Şamê dihat weşandin. Li ser zimanê kurdî û rêzikên nivîsandinê helbest û gotarên di kovarê de weşandin. Sala 1943yan de Mîr Celadet Bedirxan kovara Ronahî li Şamê weşand, Osman Sebrî çend gotar û helbest bi tîpên latînî tê de nivîsandin.
Herwiha sala 1945an di kovara Roja Nû ya ku ji hêla Dr. Kamûran Badiraxan ve li Beyrûdê dihat weşandin, gotar û helbest weşandin. Osman Sebrî yek ji nivîskarên Kurd yên jîr bû. Bi tîpên latînî nivîsand û bingehê rastnivîsa kurdî danî.
Sala 1957an, bi Dr. Nûreldîn Zaza û welatparêzên din re Partiya Demokrat ya Kurdistanê li Sûriyê damezirand. Şeva 23yê Gulana 1964an, li bajarê Helebê ew û hevalên xwe yên partiyê hatin girtin. Bi vî awayî Osman Sebrî zêdeyî 12 salan di zindanê de dimîne. Di salên jiyana xwe de zêdeyî 18 caran hatiye girtin. Di nava wan de du caran li Tirkiyê, du caran li Iraqê, carekê li Lubnanê û 13 caran li Sûriyê. Ji aliyê dewleta tirkî ve derheqê wî de du caran biryara darvekirinê hat dayîn. Di dema damezirandina Partiya Demokrat ya Kurdistanê de, ji ber çalakiyên siyasî ew û hevalên xwe ji aliyê hêzên Sûrî ve tên girtin.
Ji bo parastina ziman û çanda kurdî bi riya perwerde û xwendinê Osman Sebrî hewildan kir û nifşên nû perwerde kirin. Pirtûkên bi navê Apo, Elêfbeya Kurdî, Êşên Me, Bahoz û Çar Qehreman derxistin. Herwiha gelek helbest û gotar nivîsandin û weşandine.
Osman Sebrî bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re rûniştiye. Jê pir hes dikir û digot tu xewnên me pêk tînî, bi tevgera Partiya Karkerên Kurdistanê ez serbilind im, hunê Kurdistanê rizgar bikin. Herwiha Rêber Abdullah Ocalan di pirtûka xwe de behsa Osman Sebrî kiriye û dibêje, min welatparêzên weke wî nedîtin. Ji bo berjwendiya gelê xwe her dem bi tevger bû. Şoreşgerekî canfeda bû. Piştî 88 salan ji tekoşîna bêwestan di jiyaneke tijî berxwedan ji bo parastina doza rewa ya kurdî, sala 1993yan koça dawî kir û bi merasimeke girsayî li gundê Berkevirê yê girêdayî bajarê Dirbêsiyê sipartin axê. Têkoşîn û mîraseke çandî li dû xwe hişt, bû mînaka şervanê azadîxweaz.




# *Li hemberî sansûrê berxwedan*

**Niştiman Erdede dibêje, xebata hunermendên hatîn sansûrkirin nîşana zora Tirkiyê ye. Pêşangeha 'Marîpişta Şkestî' ji bo ku hunermend bikarin careke din azadiya hizir û axaftinê bi dest bixin, tê lidarxisin. Em dixwazin ji bo wan warekî ava bikin, warekî azad.**


Di navbera 28'ê Cotmehê û 18'ê Mijdarê de li Zurîhê bi pêşengiya kuratorê Kurd Niştiman Erdede wê pêşangeha medyayî ya hevberş ya bi navê "Fractured Spine – Widerstand durch Sichtbarkeit von Zensur in Journalismus & Kunst" (Marîpişta Şkestî-Berxwedana bi riya danxuyakirina sansurê di huner û rojnamevaniyê de) were lidarxistin. Pêşangeha ku wê li mekanê Photobasteil ya Zurîhê bi rêve biçe, gelek berhemên cihê dihewîne. Pêşangeh bi sernavê "Berxwedana bi riya danxuyakirina sansûrê di huner û rojnamevaniyê de" şêweyê berxwedana hunermendan ya hunerî dinirxîne. Berhemên tên nîşandan mafên mirovan, mafê azadiya îfadeyê û bi riya çewisandinê zexta dewletê radixin ber çavên mirovayiyê.

### Rastiya ku nayê zanîn eşkere dike

Niştiman, armanc û hedafa pêşangeha "Marîpişta Şkestî" wiha parve dike: "Huner û pêşangehên hunerî li ser pêvajoyên polîtîk û civakî dikare rexneyên bi çi awayî pêş bixe? Em bi vê pêşangeh û bernameyê dixwazin rastiyên ku derbarê Tirkiye de nayên zanîn eşkere bikin. Herwiha pêşangeh derbarê mafên mirovan ên Tirkiyeyê de jî dixwaze hesasiyetekê ava bike û piştgiriyê bide pirsgirêkên ku di vî warî de diqewimin."

### Bi zanebûn Photobasteil hilbijartine

Niştiman ji bo mekanê Photobasteil ku hilbijartine jî dibêje, ev ne tiştekî tesadûfî bûye û wiha pê de diçe: "Ji bilî dîwaran mekanên din jî hene li vir, herwiha galerî û mûze jî hene. Di nava vê atmosferê de me xwest berhemên xwe bi cî bikin da ku em karibin potansiyela wan ya hunerî çêtir derxin holê. Ji lewma me mekanê Photobastei hilbijart."
Photobastei yek ji mekanên herî navdar yên Swîsre ye. Li vir heya niha gelek pêşangehên wêneyan çêbûne û niqaşên hunerî hatine kirin. Jixwe ev mekan jî bi vê armancê hatiye damezirandin û xizmeta vê yekê dike.
Di siberojê de hurgilî û bernameyên vê pêşangehe wê li ser malpera "migratt.ch/frakred-spine" werin parvekirin. Di pêşangehê de wê film, video, performans û niqaşên bi hunermendan re hatine kirin werin nîşandan. Niştiman dibêje, bi hin pirsan emê sansûr, huner û rojnamevaniyê binirxînin. Em dixwazin bi van pirsan mirov li ser van meseleyan bihizirin û biponijin. Mînak du pirsên me yên sereke dê wiha bin; di rejîmeke otokratîk de azadiya îfadeyê tê çi maneyê? Di çarçoveya pêşangehê ya sazîtiyê de em dikarin azadiya îfadeyê çawa



bikarbînin?"

### Hunermendên ji disiplînên cuda

Di pêşangeha "Marîpişta Şkestî" de wê gelek hunermendên cihê yên ku bi disîplînên cuda dixebiten werin gel hev û derbarê sansûr, huner û rojnamevaniyê de bi berhemên xwe nîqaşan pêş bixin. Niştiman dibêje, di pêşangehê de, li Tirkiyê rewşa hunerê çi ye jî wê were niqaşkirin. Hunermendên Tirk û Kurd yên ku li Swîsreyê dijîn wê xebatên xwe nîşan bidin. Li gel van hunermendan hunermendên Swîsreyî yên navneteweyî jî dê beşdarî pêşangehê bibin û rastiyên tînin ziman li gel xebatên hunermendên din werin pêşkeşkirin."

### Ji bo berhemên sansûrkirî warên azad

Niştiman herî dawî dibêje, ez derveyî referansên xwe yên şexsî tenê bi pozisyonên herêmî û navneteweyî re mijûl nabim, herwiha ez berê xwe didim pozîsyona Tirkiyeyê jî û niqaşên li wir tên kirin jî dişopînim. Xebatên hunermendên ku hatine sansûrkirin nîşana zext û zora Tirkiyeyê nîşan didin. Pêşangeha 'Marîpişta Şkestî' bi mebesta ku hunermend bikarin carek din azadiya hizir û axaftinê bidest bixin tê lidarxisin. Em dixwazin ji bo wan warekî ava bikin, werekî azad."
Hunermendên beşdarî pêşangehê dibin ev in:
Belit Sağ, Edi Hubschmid, Ercan Richter, Ferhan Mordeniz, Gaël Le Ny, Hêlîn, Gianluca Costantini, Hito Steyerl, Husamettin Bahçe, Manuela Hitz, !Mediengruppe Bitnik, Melih Sarıgöl, Sally Schonfeldt, Yousif Salih û Zehra Dogan.

### Niştiman Erdede kî ye?

Sala 1979'an li Amedê hatiye dinyayê. Nûçegihanê radyoyê, nivîskar û sêwirmend e. Ji ber xebatên xwe yên siyasî ji Kurdistanê koç dike Ewropa. Sala 2008'an wek penaberekî polîtîk li Zurîhê bi cih dibe.
Sala 2010 û 2014'an de tevî kolektîfeke ku ji hêla penaberan hatiye avakirin dibe. Li "Dibistana Xweser ya Zurîh" (ASZ) dixwîne. Di sala 2013 û 2016'an de jî serî li "ZHdK" (Dibistana Raserîn ya Hunere a Zurîh) yê dide û di beşa "Huner û Medya" de tê qebûl kirin. Niştiman li Zurîhê dijî û xebatên xwe yên hunerî li wir berdewam dike.
*Yeni Özgür Politika*

# LUC PAUWELS: PÊŞENGÊN ŞARİSTANİYÊ PÊŞİYÊN KURDAN İN

Hasan H. Yıldırım & Hussein Erkan

Me KAWA’ciyan; her tim di nava xwe de sedemên dijminiya serdestên dinyayê ya li hemberî Kurdan gotûbêj kir. Lê bersiveke ku dilê me li ser rûne me nedît. Bersiva li hemberî pirsa me wiha bû: “Girîngiya jeopolîtîk (erdnîgarî), çavkaniyên dewlemend yên sererd-binerd yên Kurdistanê, tolhildana dinyaya Xiristiyan ji neviyên Selaheddînê Eyûbî” û hwd.




Bandora van hebe jî ne pêkan bû ku ev bibin sedem. Gelek netewe û welat xwediyên van taybetiyan in, lê dewletên hemûyan jî hene. Di ser de yên ev pêk anîn serdestên dinyayê ne. Lê çawa ku ev derfet pêşkêşî Kurdan nekirin, ji bo şkestin û binketina me ka çi pêwîst be kirin. Wê demê ji bo çi ye, sedem çi ye? Bersiv û wateyeke ku dilê me li ser rûne me nedît. Me Kurdekî ku wateyê bidiyê jî nedît. Lewra zêhnê wî tarûmar bûbû û hişê wî hatibû talankirin. Yên ev dayîn kirin jî serdestên dinyayê bûn.

Niha sedema wê hêdî hêdî derdikeve meydanê. Ev jî bi saya mirovên weke Luc Pauwels yê realîst û lêkolînerê zanistê dibe. Ji ber ku rastiya me ya me Kurdan nikarî derxin meydanê, daniye ber çavê cîhanê, em spasdar û minetdarên wî ne. Wisa xuya dibe ku, pêşengiya me ya ji şaristaniya dinyayê re û belavkirina wê li dinyayê li xweşê tîran (zordest) ên dinyayê neçûye. Ji bo wê em tine hesab kirine. Şaristaniyên me afirandîn kirine malê xwe. Yek ji sedemên herî girîng ku nehiştine em dewletê ava bikin ev e.

Halbiku “Pêşengên şaristaniyê û yên li dinyayê belav kirîn pêşiyên Kurdan in.” Eger Kurdek vê bêje berî her kesî wê gelek Kurd bi werimandin nepixandinê (mûbalexe) binirxînin. Wê bi teoriya komployê şîrove bikin. Lê dema yê vê dibêje Luc Pauwels yê Flemenê Belçîkî be nêrîn tê guhertin. Luc Pauwels, dîrokzanekî girîng yê Flemenan e. Dîroka Flemenan nivîsiye. Dema dest bi nivîsa Flemanan kirî bi Kurdan ketiye ser rê. Li ser vê xwe spartiye bi sedan lêkolînên arkeolojîk, genetîk û antropolojîk û derbarê dîroka Kurdan de pirtûkek nivîsiye. Pirtûk di demeke nêzîk de derketiye.

Li ser bergê pêşî yê pirtûkê, li jorê navê nivîskar: Luc Pauwels. Rêzika piştî wê Dîroka Kurdan (Geschiedenis Van de KOERDEN). Li rêzika binî jî têkoşîna gelekî ya ji bo welatê xwe (De strijd van een volk voor een eigen staat) dinivîse.

Luc Pauwels, di pirtûka xwe de dema dîroka Kurdan lêkolîn dike, têgîn û agahiyên xwe dispêre lêkolînên zanistî yên zanîngehên dinyayê yên herî girîng û lêkolînên genetîk, antropolojîk û arkeolojîk yên gelek welatên girîng yên dinyayê.

Luc Pauwels, di pirtûka xwe de dibêje, pêşiyên Kurdan li dinyayê cara pêşî li Mezopotamya li bajarê Ur’ê konfederasyona eşîran û pişt re şahtî-kraltî ava kirine. Herwiha diyar dike ku li Misrê cara pêşî ji aliyê pêşiyên Kurdan ve pîramît (ihram) hatine çêkirin. Yên destpêkê derbasî girava Brîtanyaya Mezin bûyîn, bi cî bûyîn û ji bo bicîbûna mirovan zemîn amade kirîn pêşiyên Kurdan in. Yên şerên Troya kirîn pêşiyên Kurdan in. Yên bajarê Romaya dîrokî ava kirîn pêşiyên Kurdan in. Şêniyên destpêkê yên paytexta Hollanda Amsterdam’ê pêşiyên Kurdan in.

Luc Pauwels, di pirtûka xwe de rola jinên Kurd jî rave dike û qîmetê Kurdan dayî jinan jî bi awayekî pir baş şîrove dike. Dibêje, di dîrokê de ji bo pêşketina civakê bi qasî mêrên Kurd jinên Kurd jî berpirsiyariya ketî ser milê wan pêk anîne. Ev taybetî li cem jina Kurd ya îro jî heye. Îro lehengiya di qada şer de nîşan dide mînaka wê ye.

Çawa ku em dizanin huner û peykerên nûjen li derdora 500 salî berî niha li Ewropa dest pê kirine. Halbiku peykerê herî kevin û pêşketî berî 3000 salî ji aliyê hunermendên Kurd ve hatiye çêkirin. Sala 1948an mûzeya Brooklyn ya Amerîka ev peyker bi 57 milyon û 161 hezar dolarî kiriye.

Luc Pauwels, di pirtûka xwe de diyar dike ku di pêşketina mirovayiyê de Kurdan pêşengî kiriye û bi gelek lêkolînên di gelek mijaran kirîn de li ber çavan radixe ku di gihîştina mirovayiyê ya îro de roleke gîrîng ya Kurdan heye.

Luc Pauwels, Kurdan, li hemberî rola wan ya erênî ya dîrokî, piştî lêkolîna li ser jimara wan û rewşa wan ya siyasî “bi gelê di dinyayê de xwediyê zimanê herî zengîn û bêdewlet” bi nav dike. Herwiha dibêje, ji bo guhertina vê rewşê û ji bo xwedîderketina li welatê xwe Kurd mirinê didin ber çavê xwe û şer dikin.

Luc Pauwels, di pêşeka pirtûka xwe de cî daye daxuyaniya dîrokzanê Çekî yê binavûdeng Milan Hûble. Milan Hûble wiha dibêje: “Ji bo tasfiyekirin û tinekirina gelekî divê hişê (bîr, hafîze) wî bê jêbirin. Destpêkê dîroka wî, çanda wî, urf û adetên wî, kevneşopiyên wî tên tinekirin. Pişt re dîrok û çandeke nû bi ser wî gelî de tê sepandin. Pişt re ew gel hêdî hêdî dîrok û çanda xwe ji bîr dike. Di nava demê de hem ew gel, hem dinyaya li derdora wî ji bîr dikin ka ew gel kî ye. Kurd xistine rewşeke wisa.

Lê rastî nayê jibîrkirin. Rojekê derdikeve meydanê û xwe bi her kesî dide qebûlkirin. Ev jî bi saya şexsiyetên weke Luc Pauwels dibe. Pirtûka Luc Pauwels nivîsî û pêşkêşî mirovayiyê kirî Dîroka Kurdan (Geschiedenis Van de KOERDEN) heta niha bi Flemenî û Fransizî tenê hatiye weşandin. Teqez divê bi her zimanî bê weşandin. Bi taybetî divê Kurd vê pirtûkê bixwînin.

# `Emê çanda alîkariyê di nava civakê de belav bikin`

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

**Pêngava Xwebexş ya Qamişlo, bi dirûşma ‘Ez hes dikim alîkariyê bikim’, ji gelek malbatên xizan û koçber re dibe alîkar.**




Rêvebera Pêngava Xwebexş ya Qamişlo Talîn Mihemed derbarê xebata xwe de ev agahî dan: “Karê me li hundirê bajarê Qamişlo tenê ye. Ji ber ku karê me bêberdêl e, me navê Qamişloya Xwebexş li pêngava xwe kir. Bi dirûşma ‘Ez hes dikim alîkariyê bikim, em alîkariya civaka xwe dikin. Ji 2020`an ve me dest bi pêngavê kiriye û hê jî dewam dike. Komîteya me ji heft kesan pêk tê. Her yek li ser taxekê disekine. Destpêkê wek komeke mamoste me nîqaşa vê pêngavê kir û me xwest alîkariya gelê xwe yê xizan bikin. Her mamosteyî her meh hezar lîre ji fonê xwe wek alîkarî dida. Her heyvê em alîkariyê didin çend malbatan. Heyva destpêkê me 500 hezar kom kirin û li çend malbatên xizan belav kirin. Bi demê re kesên alîkariyê dikin û pereyên alîkariyê zêde dibin. Heyvekê gihîştin 20 milyonan. Li gorî pereyên heyîn em alîkariyê didin hewcedaran. Destpêkê wek komîte em diçin serdana malbatê û li gorî rewşa wê em alîkariyê didin. Pîvana me ya alîkariyê ew e ku di malbatê de eger bav yan dê tinebin, yan jî kesek astengdar hebe herwiha kesên ku nexweşiyên giran bi wan re hebin, em alîkariya pereyan, yan jî tiştê ji wan re pêwîst didin. Ji bilî pereyan em bi gelek rengan alîkariyê dikin; weke selikên xwarinê, dermanên nexweşan, cilên zarokan û gelek caran jî me goşt belav kiriye. Jixwe di dema korona de me şûşeyên oksîjenê jî belav kirin.”

Talîn Mihemed da zanîn ku gelek kesên li welatên derve bi wan re dibin alîkar û axaftina xwe wiha domand: “Piştî destpêkirina kar me têkîlî bi gelek kesan re kir. Ji ber wê heyva duduyan gelek kesan xwest bi me re bibin alîkar. Alîkarê ji Bakur, Başûr, Feransa û Hollanda jî ji me re hatiye. Her heyv pereyan ji me re rêdikin. Em jî li xizanan belav dikin. Ne malbatên xizan tenê, gelek malbatên me yên koçber jî hene em alîkariya wan dikin. Têkiliya me gropa `Qamişlo ji her kesî re, Qamişlo xweşiktir e` jî heye. Gelek caran ew jî dibin alîkar. Rûpela me ya Facebook jî heye, dema em alîkarî belav dikin, em wêne û dîmenên wê jî dadixin ser rûpelê.”

`Emê barê civakê sivik bikin`

Talîn Mihemed axaftina xwe wiha qedand: “Em bi karê xwe kêfxweş in. Çimkî em alîkariyê didin civaka xwe û dilê wan geş dikin. Ez bi hêvî me ku li bajarên me yên din jî pêngavên wiha bên destpêkirin. Ji bo pêşketina çanda alîkariyê û ruhê welatparêziyê pêdivî bi xebata wiha heye. Banga me ji rêxistin û saziyên navneteweyî re jî heye ku bi me re bibin alîkar da em barê civaka xwe sivik bikin.”

Endama pêngavê Sîham Ehmed jî ji me re behsa karê xwe kir û got, ez rêvebera taxa Qenat Siwês û Zeytoniyê me. Li taxê dema kesek hewcedar hebe ez agahiyê didim komîteyê û em pê re dibin alîkar. Ez ji zû ve vî karî dikim. Berî vê pêngavê jî min ev kar dikir. Min bi tena xwe kar dikir. Min pere didan hev û li malbat û kesên xizan belav dikirin. Niha jî di pêngavê de kar dikim. Keyfa min pir ji vî karî re tê. Çimkî dema ez pêwîstiya kesekî çareser dikim pir pê kêfxweş dibim. Heta ez hebim ezê vî karî bikim û vê çandê di nava gelê xwe de belav bikim. Di demên pêş de jî, ji bo civaka xwe emê gavên mezintir biavêjin”







## Mixabin guhertin nîne, metirsî heye....

Dilyar CiZÎRÎ

Di roja 10’ê Cotmehê de hilbijartinên perlemantoya Iraqê yên pêşwext hatin lidarxistin. Li gorî min ev hilbijartin ne ji rêzê ne. Lewra biryara wê piştî xwepêşandanên gelê Iraqê yên payîza 2019’an ku bi armanca têkoşîna li dijî gendeliyê û bêxemiya hikûmetê derketibûn, hat standin.

Wê demê piştî bi sedan kes hatin kuştin û bi hezaran birîndar çêbûn, hikûmeta Mistefa Kazimî bi mijara hilbijartinan xwest gel razî bike. Di roja hilbijartinan de jî Kazimî bi daxuyaniya “Em bi Ser ketin, me tişta li ser xwe pêk anî” peyam dan. Her çendî kêmayî hebûn jî, rast e Kazimî erkê xwe yê pêkanîna hilbijartinan bi cih anî, sindoq danîn û hemû amedekariyên teknîkî bi cih kirin. Civaka Iraqê jî di roja hilbijartinan de erkê xwe pêk anî û peyama xwe da. Dema mirov rêjeya ji sedî 36 ya çûna ser sindoqan di giştî Iraqê de dibîne, bi hêsanî mirov dikare bibêje, ti baweriya civakê bi van hilbijartinan û guhertinên wê bi xwe re bînin, nîne. Kazimî jî ya xwe got û welatiyan jî ya xwe got. Bi vê yekê em li pêşberî du nerînên dijberî hev in.

Ji bo Kazimî û tevayiya siyasetmedarên Iraqê ya girîng ne guhertina demokratîk û berjewendiyên civakê ye. Ya girîng berjewendiyên hêzên biyanî ku hatine ser xaka Iraqê û vir de wir de lê didin berhemên wê talan dikin.

Dema ez behsa Iraqê dikim, mebesta min başûrê Kurdistanê ye jî. Çawa li Iraqê wê ti guhertin pêk neyên, ne bawer im li başûrê Kurdistanê jî pêk were. Li vir jî PDK’ê, YNK’ê û hin partiyên girêdayî wan amadekarî kirine û wê rê nedin namzetên serbixwe, yan namzetên PADÊ yên Şingalê bikevin perlemantoyê. Di roja hilbijartinan de ev ji lîstok û tevgera hêzên wan de wekî tîrêjên rojê diyar bûn.

Tevî hêviyên guhertinê di van hilbijartinan de nîne, wer xuya dike wê piştî van hilbijartinan bi demek ne dirêj rewşek aloz ya ji berê kûrtir derkeve. Bi taybetî di vê dema behsa vekişîna hêzên Amarîka di rojevê de ye. Wer xuya dike piştî vekişîna wan wê tevlîhevî di asta tevayiya Îraqê de zêde bibe, ev alozî wê bandora xwe li başûrê Kurdistanê jî bike.

Cihê wê kirîzê bi rehetî derbas bike jî wê Şingal be. Lewra sîstema Rêveberiya Xweser ya Demokratîk xwe dispêre hêza gel û herikîna wê li benda ti aliyan nasekine. Ev jî wê hêzên wekî dewleta tirkî ku rojane xaka Iraqê binpê dike û çekên kîmyayî li wir bi kar tîne, herwiha Îrana ku hema hema piraniya siyasetmedarên Iraqê kirine gustîl di destê xwe de aciz bike.

Li ser vî esasî dibe ku plan û lîstikên hê girantir li dijî Şingalê pêk bînin. Li dijî van planên wan ji xelkê Şengalê bi giştî û tevayiya welatiyên herêmê tê xwestin têkoşîna xwe ya ji bo azadî û demokrasiyê bidomînin.



# Yasemîna Sûriyê

**Şehîd Hefrîn Xelef ne ji bo gelê Kurd tenê, ji bo azadiya gelên Sûriyê tevan dixebitî. Jixwe dewletên dagîrker yên mîna Tirkiyê, her tim jinên xwedîfikir û bihêz dikin hedefa xwe. Çimkî dixwazin hêviyên jinan bişkînin û wan weke demên berê bêdeng û bêmaf bikin.**

**Darîn Silê/Qamişlo**

Hefrîn xwediya baweriyeke wisa bû ku aloziya Sûriyê bi şer nayê çareserkirin. Her tim digot, çareseriya aloziya Sûriyê bi destê gelên Sûriyê bixwe ye. Ancax ev jî bi riya diyaloga Sûrî-Sûrî were misogerkirin. Ji ber wê her bi aliyên siyasî û civakî re di nava hevdîtinan de bû. Lêgerîna wê ya çareseriya aloziya Sûriyê heta kêliya dawî dewam kir.

**`Bi hatina Hefrînê re yasemînek hat dinyayê`**

Dayîka şehîd Hefrîn Xelef, Sûad di salvegera duduyan ya şehadeta keça xwe de, ji me re behsa taybetmendiyên Hefrînê yên piçûktiyê kir û wiha got: “Şehîd Hefrîn sala 1984`an li bajarê Dêrikê hat dinyayê. Berî wê keçeke min tenê hebû, navê wê jî Zozan bû. Ew jî şehîd e. Dema Zozan piçûk her tim digot, yadê çima xwîşkên min nînin. Ji ber wê min dixwest xwîşkeke wê çêbe da Zozan ne tenê be. Dema Hefrîn çêbû ez pir kêfxweş bûm. Bi hatina Hefrînê re yasemînek hat dinyayê. Ji piçûkayî ve Hefrîn di nava malê de pir delalî bû. Lê ne delaliya min tenê, ya her kesî bû û bi wê delaliyê mezin bû. Dema çû xwendinê jî, di nava hevalên xwe de pir heskirî bû. Wê jî cihê xwe di dilê mirovan de çêdikir.”

Sûad da zanîn ku teybetmendiyên Hefrîn li her cihî dihatin heskirin û axaftina xwe wiha domand: “Dema çû refa yekê min cilên dibistanê jê re hazir kirin. Min ne cilek, du cil jê re çêkirin. Wê demê ez terzî bûm, min bi rengekî çuda cil jê re dirûtin. Min dixwest her tim ji hevalên xwe çudatir be. Heta niha jî cilên wê yên piçûktiyê li gel min in. Li dibistanê pir ji hevalên xwe hes dikir û pir dilbirehim bû. Her tim para xwe ya xwarinê dida hevalên xwe. Digot bila hevalên min bixwin, eger para min ma ezê jî bixwim. Hevalên wê ne Kurd tenê bûn, Ji her gelî hevalên wê hebûn. Ti cudayî nedixist navbera Kurd û Ereban. Li dibistanê pir jîr û zîrek bû. Ji xwendina xwe gelek hes dikir. Mamosteyên wê jî pir keyfa wan jê re dihat. Çimkî xwendekareke jêhatî û her tim serkeftî bû. Bi wî awayî Hefrîn xwendina xwe domand heta derbasî zanîngehê bû. Li zanîngeha Helebê beşa endezyariya çandiniyê xwend. Pênc salan li Helebê ma heta ku zanîngeha xwe temam kir. Her demekê ez diçûm gel wê Helebê min xwarin û pêdiviyên wê jê re dibirin. Dema zanîngeh bi dawî kir vegeriya malê êdî kar û xebata hevalan kir û di nava gelek saziyên Rêveberiya Xweser de cihê xwe girt.”

Piştî şoreşa 19 Tîremha 2012’an, Hefrîn bi awayekî çalak xwendevanan bi rêxistin dike. Pişt re jî di nava saziyê civaka sivîl de kar dike. Piştî ku şoreşa Rojava sazî û dezgehên xwe ava dike, Hefrîn dibe rêvebera Meclisa Aborî ya bajarê Qamişlo. 21ê Kanûna 2014’an dema Rêveberiya Xweser tê ragihandin û saziyên rêveberiyê jî tên avakirin, Hefrîn wek Cîgira Desteya Enerjiyê cihê xwe di rêveberiya Kantona Cizîrê de digire. Piştî 2015’an jî Hefrîn wek Hevseroka Desteya Aborî ya Cizîrê tê hilbijartin.

**Piştî ku Hefrîn demekê karê aborî dike, sala 2018’an derbasî xebata siyasî dibe.**
**Hewl dide partiyeke siyasî ku nûnertiya tevayiya gelên Sûriyê bike ava bike.**




27ê Adara 2018’an li bajarê Reqayê Kongreya damezrîner ya Partiya Sûriya Paşrojê tê lidarxistin. Di kongreyê de partiyên siyasî yên kurdî, erebî, suryan, şêxên eşîran yên bakur û rojhilatê Sûriyê amade dibin. Ji ber ku Hefrîn Xelef bi çalakiya xwe ya pêşxistin û parastina mafan dihat naskirin, di kongreya damezrîner de dibe Sekretera Giştî ya partiyê.

Sûad got, Hefrîn bi armanca avakrina Sûriyeke demokrat û wekhev Partiya Sûriya Paşrojê da avakirin û axaftina xwe wiha domand: “Rojekê berî ku Partiya Sûriya Paşrojê were avakirin Hefrîn hat malê, gote min yadê ezê partiyekê ava bikim. Min jê re got tuyê çi partiyê ava bikî, got yadê me saziya Nûrî Dêrsimî, Desteya Enerjiyê û Aborî ava kir. Êdî niha tê xwestin ku em partiyeke Kurd û Ereban ava bikin. Bi vê armancê partiya başrojê hat avakirin. Dema partî hat avakirin Hefrîn bû berpirsiyara wê. Êdî Hefrîn bi heyvan nedihat malê. Destpêkê li her bajar û gundên herêma Cizîrê û mal bi mal digeriyan û civînên xwe li dar dixistin. Salekê û 9 heyvan di Partiya Paşerojê de kar kir. Di wê demê de dinyayê li hev da. Wek jineke Kurd dixwest paşrojeke baş ji gelê xwe re bide avakirin. Têkîliyên Hefrîn bi her dewletê re hebûn. Berî ku şehîd bibe bi heyvekê çû Îmaratê têkîliyên xwe li wir jî çêkirin. Êdî li dewleta tirkî û kesên ku destekê didinê nexweş hat ku jineke weke Hefrîn guhertinê di welatê xwe de çêke. Tirkiyê baş dizanîbû ku ev keça Kurd wê Sûrî li hev bîne û mafê mirovan bi dest bixe.”

**12’ê Cotmeha 2019`an, dema ku Sekretera Giştî ya Partiya Sûriya Pêşrojê Hefrîn Xelef bi erebeya xwe li ser riya navneteweyî ya bajarê Qamişlo, çeteyên DAIŞê yên girêdayî Tirkiyê rê lê digirin û bi awayekî hovane şehîd dixin.**

Sûad got, armanca Hefrîn ew bû ku Sûriyeke azad, miletekî azad û li ser xakeke azad bigihîne û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Tirkiyê ne ji bo kesayeta Hefrîn tenê koplo li ser bi kar anî û ne ku ji bo jineke Kurd e yan jî Ereb e, ji bo rê li ber fikirê wê bigre û fikirê wê tine bike. Van kesan xwest ku bi kesayeta Hefrîn îradeya jinê bişkînin û careke din jinê bixin nava tariyê. Çimkî jin êdî bûye partî û siyastmedar. Herwiha xwestin bi şehadeta Hefrîn destkeftî û armancên jinê bêwate bikin û jinê bêmoral bikin. Lewra dijmin dizane şoreşa Rojava ya jinê ye. Li ber çavên min bû ku wê rojekê Hefrîna min bikin hedef. Mixabin di dawiyê de Hefrîn bi kemîneke çeteyên dewleta tirkî yên ku li dijî mirovayiyê kar dikin hat girtin û bi awayekî hovane û bêwijdan şehîd xistin. Eger fîşekek lê bidana wê Hefrîn şehîd bixistan, lê xwestin bi şêwazekî dijmirovî şehîd bixin.”

Dayîka şehîd Hefrîn Xelef, Sûad bîr xist ku wê doza mafê Hefrîn li her deverê kiriye û axaftina xwe wiha qedand: “Dema dawî jî min li welatên din yên derve doza mafê Hefrîn vekiriye. Ez niha jî têkîliyê bi gelek parêzerên Ewropî re datînim da ku doza wê fermî were vekirin. Jixwe berî demekê jinên Îtalî jî wek piştgiriya mafê jinê dozek li Îtalya vekirine. Li her deverê doza Hefrîn di lêkolînê de ye. Sala duduyan ya şehadeta Hefrîn banga min ji cîhanê tevê re bi taybetî ji jinan re heye ku li keda Hefrîn xwedî derkevin. Banga min ji jinên Tirk re jî heye ku li dijî Erdoganê faşîst derkevin û bêjin êdî bes e dem dema azadî û mirovayiyê ya dem dema azadiya jinên cîhanê ye. Ez bi hêvî me ku di sala duduyan de jî bîranîna Hefrîn xwesteka wê ya avakirina Sûriyeke demokrat pêk were. Wek dayîka Hefrîn heta ku ji min were ezê ji bo azadî aştiyê têkoşînê bikim. Da ku yasemîna Sûriyê bibe aştiya gelan û ti cudayî di navbera ti kesî de nemîne. Lewra em tev yên vê xakê ne. Herî dawî ez dibêjim dem dema azadiyê ye em dereng mane.”

# Xelîfan ne cara yekê ye, kemînên PDK`ê dîrokî ne

Serbest EHMED/Qamişlo



**PKK mîrasa Kurdan ya berxwedanê, PDK jî mirasa xiyanetê ye.**

Bi sedê salan e gelê Kurd li hemberî êrişên hêzên dagîrker û qirker li ber xwe dide. Mîrasa vê berxwedana jî îro li çiyayên Kurdistanê li hemberî êrişên dewleta tirkî ya dagîrker bi têkoşîna PKKê dewam dike. Lêbelê bi qasî gelê Kurd berxwedêr û têkoşer e, kesayetên xiyanetkar û hevkarên dijmin jî her tim hebûn. Dema mirov li dîroka Kurdan ya 40 salan meyze dike diyar dibe ku mîras û erkê berxwedan û têkoşîna azadiya gelê kurd PKKê rakiriye. Lê li gorî kiryarên PDKê yên ji avabûnê heta niha (75 sal) diyar e ku ev mîrasa xiyanet û hevkariya dijmin ya di nava Kurdan de jî PDK radike. PDK tevayiya derfetên bi dest xistîn ji bo xizmeta dijminê Kurdan bi kar tîne û li kêleka dewleta tirkî ya dagîrker li hemberî gerîlayên azadiyê dest bi şerekî dijwar kiriye. Emê hewl bidin di vê dosyayê de, derveyî kemîna Xelîfanê ya PDKê li dijî gerîlayên azadiyê, kemînên wê yên li dijî têkoşîna azadiya Kurdan yên ketîn dîrokê par ve bikin.

## Kemîna Xelîfanê 28ê Tîrmeha 2021'ê

Piştî qutbûna agahiyan ji komeke gerîlayên PKK`ê li Xelîfanê, 3yê Cotmehê Navenda Ragihandan û Çapemeniyê ya HPG bi daxuyaniyekê agahiyên derbarê Xelîfanê de eşkere kirin. HPG`ê da zanîn ku şeva 28-29`ê Tebaxê komek gerîla ku dixwestin ji herêma Qendîlê biçin herêma Behdîna, li nêzî çemê Zapê ketin kemîna çekdarên PDK`ê. Di encamê de 5 gerîla şehîd bûn û dibe ku gerîlayek bi birîndarî dîl hatibe girtin. Jixwe gerîlayê bi navê Heqî yê xwe ji kemîna PDKê rizgar kirî, ev agahî par ve kirin.


## Kemîna çemê Hêzil 1982

12'ê Mijdara 1982 yan dema komek gerîla derbasî başûrê Kurdistanê dibe, li nêzî çemê Hêzil ji aliyê çekdarên PDK`ê ve dikeve kemînê û gule li wan tên reşandin. Di encama vê kemînê de 8 gerîla (Şahîn Kîla Ûz, Cîhad Dayan, Mûsa Îlik, Fewzî Şîmşek, Fuad Arturk, Fewzî Hantaş, Hesen Ozçelîk û Beşîr Aksû) şehîd dibin.

## Kemîna Qendîlê 1983

Ji ber nakokiyên di navbera YNK û PDK`ê de, fermandarê PKKê Mehmed Karasungur ji bo lihevkirina her du hêzan dikeve tevgerê. Lê Mehmed Karasungur û şervanê PKKê Îbrahim Bîlgîn 2yê Gulana 1983yan dema ji bo hevdîtinê diçin gel hêzên PDKê, wan li çiyayê Qendîlê bi komployekê şehit dixin.

## 1985 li Dihokê dîsa kemîn



PDK 16ê Nîsana 1985an jî, li nêzî bajarê Dihokê komeke gerîla ya ji 8 kesan dorpêç dike. Koma gerîla bi pêşengiya Idrîs Urmen, Hozan Sefkan in. Di encama kemînê de, her 8 gerîla şehîd dibin.

## Kemîna çemê Rêzan 1996

Dr. Sîrwan yek ji damezrînerên Yekîtiya Niştimaniya Demokrat ya Kurdistanê (YNDK) bû. Dr. Sîrwan di gel çend hevalên xwe li gundekî nêzî çemê Rêzan yê Silêmaniyê bi cî bûbûn. Lê dîsa bi heman hişmendiyê, 4'ê Cotmeha 1996an çekdarên PDK`ê gund dorpêç dikin û Dr. Sîrwan û 4 hevalên wî şehîd dixin.

## Nexweşxaneya Hewlêrê 1997

Piştî êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên 16ê Gulana 1997'an yên li ser gerîla, PDKê bi hevkariya MÎTê êrişî gerîlayên birîndar yên li nexweşxaneya Hewlêrê kir. Di êrişê de 80 birîndarên PKKê şehîd xistin û gorên wan heta niha ne diyar in.

## PDK di polîtîkaya xwe de israr dike.

Bi derbasbûna salan û dewamkirina êrişên dewleta tirkî ya dagîker, PDK bi her şêwazî hevkariya dagîrkeran dike. Di êrişan de li kêleka dijminê Kurdan şer dike. Weke `êrişa 5ê Tebaxa 1991ê, êrişa Xakurkê 1992, êrişên Adar û Gulana 1995an, êrişa Gulana 1997an, êrişên Zapê 2007 û 2017an`. Hem bi rengê istixbaratî agahiyan dide dewleta dagîrker ya Tirkiyê, hem bi kemînan gerîlayên têkoşîna azadiya gelê Kurd şehîd dixe. Pir caran HPGê bang li PDKê kir ku ji vê polîtîkyayê dûr bikeve û nekeve xizmeta dijminê Kurdan. Lê diyar e ku PDK di polîtîkaya xwe de biisrar e. Ji bo wê ev êrişên dewleta tirkî ya dagîrker ji 2017'an heta niha dewam dikin û PDK jî bi fermî li kêleka wê şerê gerîlayê PKKê û gelê Kurd dike. Bi pêşengiya MÎTa Tirkan, li başûrê Kurdistanê bi 10an walatparêz û rojnemevan girtî ne û winda ne. Bi istikbarata PDKê bi dehan pêşeng û şervanên PKKê bi destê dewleta tirkî ya faşîst şehîd bûne. Bi heman şêwazî, bi 10an walatî û walatparêzên li başûrê Kurdistanê bi destê dewleta tirkî dane kuştin. Her roj li hemberî van kiryarên PDKê gelê Kurd bi çalakiyan nerazibûna xwe dide diyarkirin û rayedarên PKKê ji bo PDK ji riya xiyanetê vegera bangawazî dike. Lê PDK di vê riya xwe de israr dike!





Pêşengên şoreşên sedsala 20 û 21'ê û pêşengên faşîzms heman sedsalan

Ahmet Aktaş

Kesên ku mohra xwe li van her du sedsalên bîstî û bîst û yekê dane, eger mirov wisa destnîşan bide, dibe ku ne şaş be:

Yên pêşengî ji şoreşên sedsala bîstî re kirin; li ser şopa Marx û Engels, Lenîn, Mao, Hoşimîn, Kîm Il Sung, Castro, Che Givara, Gandî, Mandela û hwd.bûn.

Yên pêşengî ji faşîzma sedsala bîstî re kirin; Musollini, Hitler, Salazar, Franko, Kenan Evren, Seddam û hwd.bûn.

Bi kurtayî faşîzm, dikare wisa were şîrovekirin; rejîmek, bi bingehîn li ser hêzên dewletê, bi navê nijadperesetiyê û hinek jî olperestiyê, belê bi darê zorê serdestiya xwe, dîktatoriya xwe li ser gel bi rê ve birine.

Ji aliyê din ve, bîrdoziyeke kapîtalîst a li dijî sosyalîzmê ye. Jixwe mirov bala xwe dide dîroka wê jî ev naverok û armanca wê diyar dibe. Dîktatoriyên faşîst, piştî salên 1920'an dest pê dike; li Îtalya, Portekiz, Almanya, Ispanya, Tirkiye û hwd. hema penc-şeş salan piştî Şoreşa Cotmeha 1917'an a Yekîtiya Sovyetê.

Şoreşa Yekîtiya Sovyetê jî, sê-çar salan piştî Cenga 1'ê ya cîhanê çêbûbû. Tê zanîn ev cenga cîhanî, li ser temahiya parvekirina welatên cîhanê di navbera dewletên kapîtalîst-emperyalîst de hatibû derxistin. Erê hinek ji wan dibe ku ji yên din kêmtir derbe xwaribin, lê hemû dewlet lawaz ketibûn.

Jixwe yek ji sedemên xurt jî ev bû ku Şoreşa Sovyetê zû mezin bû, bandora xwe li ser gelek welatan çêkir û yek li pey yekê tevgerên şoreşgerî derketin holê û van dewletên serwerên cîhanê gelek tirsandin. Lewma mirov dikare bêje sedema sereke ya ku vana ajotin karê şidetê û faşîzmê ev tirsa ji şoreşên cîhanî bû.

Lê weke tê zanîn vê tirsa wan pir pere nekir û heta mirov dikare bêje cenga cîhanî ya 2'an, ji encamê vê tirsê derket, belê bi ser neketin, berovajî, hema hema ew rejîmên faşîst hemû ruxiyan an derbeyên giran xwarin.

Li cîhanê faşîzîm têk diçû, belê li Kurdistanê zindî dibû; faşîzma Kenan Evren, Seddam Huseyin û rejîmên Îranê û Suriyeyê jî ne ji vanan dûr bûn.

Îca em tên sedsala 21'ê û em bala xwe didên, şûna Kenan Evren, vê carê serkêşiya vê faşîzmê Receb Tayib Erdogan dikişîne. Jiber ku ewqas çavbirçiyê faşîzmê ye, jibo ku serkêşî ji dest neçe rê nade kesî. Lewma navbera wî û hempayên wî ne gelek aram e.

Ma gelo mirov nikare vêna wisa bişibîne? Çawa li ser tirsa Şoreşa Sovyetê faşîzim hate bipêşvexistin, her nuha jî li himberî tirsa ji xurtbûn û berfirehbûna bandora Şoreşa Kurdistanê, kevneperestiya cîhanê faşîzma R.Erdogan xurt dikin.

Her wiha mirov dikare wisa jî formule bike; di vê sedsala bîstûyekê de, fîlozof û pêşengê şoreşan Rêber Ocalan e, li himber jî pêşengê faşîzman R.Erdogan e.

Her çendîn li dora R.Erdogan, çete û kujerên mîna DAIŞ, El Nusra, H.T.Ş û hwd.civandibin jî, li Rojava, Idlıbê, Başûr û hwd.dîsa nikare zêde temenê desthilatiya faşîzma wî dirêj bikin.

Wisa diyar dibe ku êdî ew gotina dibêjin, "ew ê di wê xwîna ku dirijînin de bifetisin" nêz bû ye. Jiber ku gelek mînakên berbiçav hene. Li dijî gerilla çekên teknolojiya herî modern bi kartînin, lê dîsa jî nikarin berxwedana lehengî ya gerîla bişkînin. Wisa lê hatiye, êdî xiyanet ji nema zêde bikêr tê an nikarin zêde bidin xebitandin. Bi tenê di destê wan de maye çek û xaza KÎMYEWÎ.

Di encamê de weke Rêber APO jî dibêje, "hêza ti teknolojiyê ne qasî hêza îradeya însan e, hêza herî mezin îradeya însan e"! Ev îradeya gelê Kurdistanê, dikare faşîzma R.Erdogan hilweşîne!



# "Emê heta dawiyê li dijî komplo û dagîrkeriyê têbikoşin"

Mihemed Şahîn: Qirkirin û êrişên dagîrkeran yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê domandina komploya 9ê Cotmehê ya li ser Rêber Apo ne. Ji bo bêbandorkirina wê jî divê li her derê têkoşîn û berxwedan xurttir bibin.

Navenda Nûçeyan-Qamişlo



"Nirxên demokrasiyê dijmin ditengijînin"

Têkildarî komploya 9ê Cotmehê, herwiha êriş û dagîrkeriya dewleta tirkî yên li herêmê Hevserokê Meclisa Rêveber ya Herêma Firatê Mihemed Şahîn ji me re axivî.

Şahîn diyar kir ku ji destpêka krîza sûriyê ve proje û armancên dewlet tirkî yên demdirêj li sûriyê hene. Ji ber wê hem leşkerî, hem siyasî alîkarî da çeteyan û ev nirxandin kir: "Dewleta tirkî dixwest bi riya van hêzên tarî li Sûriyê sîstemeke bi rengê islamî û radîkal ava bike û ev sîstem jî bibe dendika vegera projeya Osmanî li seranserê Rojhilata Navî. Lê şoreşa demokratîk û têkoşîna azadiya gelan ya li bakur û rojhliatê Sûriyê, plan û projeyên wê hema hema bêencam kirin. Vê şoreşê herêmeke demokratîk ava kir û li Rojhilta Navî bû mînaka demokrasiyê. Ji ber wê dijminê demokrasiyê tengijî û piştî 21 salan bi hişmendiya 9ê cotmeha 1998an, êrişî Serê Kaniyê û Girê Spî kir."

Şahîn teqez kir ku Tirkiyê ne bi serê xwe êriş kir, hesabên hêzên navneteweyî êriş bi rê ve birin. Ev jî peyamê dide ku, hem komploya 9ê Cotmehê ya li ser Rêber Apo dewam dike, hem çi pergal ango rêveberiyek li ser bingehekî demokratîk bê avakirin, wê bibe amanca êrişên dewleta tirkî.

## "Du salan qirkirin û guhertina demografîk"

Hevserokê Meclisa Rêveber ya Herêma Firatê da zanîn ku çeteyên DAIŞê û EL-Nusera ji aliyê Tirkiyê ve bi nav û tîp cuda hatin amedekirin û li ser tankên xwe derbasî Serê Kaniyê û Girê Spî kirin. Rewşa niha ya li herêmê jî wiha rave kir: "Digel êrişên hovane, li ber çavê cîhanê sûc û kiryarên herî qirêj, yên weke bikaranîna çekên kîmyayî, hatin kirin. Dewleta dagîrker û çeteyên wê piraniya xelkê herêmê ji warê wan koçber kirin. Niha jî rojane guhertina demografîk bi awayekî sîstematîk dike. MÎTa tirkî ji her çar aliyên cîhanê çete û malbatên wan, kom dike û li şûna Kurdên li herêmê bi cî dike. Ev sûc tev bi belge ne. Bêdengiya cîhanê li hemberî sûcên dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê nîşan dide ku bi erêniya wan sûc tên kirin."

Mihemed Şahîn bi awayekî eşkere got, hebûna dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê li Sûriyê krîzê kûrtir dike û axaftina xwe wiha qedand :"Li hemberî êrişan berxwedaneke pêhempa hat kirin û niha jî tê kirin. Gel û şervanên QSDê bi baweriyeke xurt vê têkoşînê dikin. Rêveberiya Xweser jî li ser vî bingehî xebat û têkoşînê dike. Divê gelê me jî li dijî komplo û dagîrkeriyê têkoşîn û berxwedana xwe xurttir bike. Her kes di wê baweriyê de ye ku bê derketina hêzên dagîrker û vegera xelkê van herêman ser mal û milkên xwe, krîz li Sûriyê nayên çareserkirin."

## Komployên 9ê Cotmehê, Amerîka û Rûsya



Zekî BEDRAN

Dewleta tirkî dijminiya Kurdan didomîne. Çawa ku tê zanîn 9ê Cotmeha 1998an li hemberî Rêber Apo komployeke navneteweyî hatibû kirin û ji Sûriyê hatibû derxistin. Pişt re ji Kenya revandibûn û radestî Tirkiyê kiribûn. Di ser kompoyê re 23 sal derbas bûn. Lê dijminiya dewleta tirkî ya li hemberî Kurdan kêm nebû û ranewestiya. Xelekên nû bi ser vê komployê ve bûn. 9ê Cotmeha 2019an hikumeta Erdoganê faşîst bi hevkirina bi Amerîka re Serê Kaniyê û Girê Spî dagîr kirin.

Bi tevlîkirina PDK, Iraq, Amerîka û NY 9ê Cotmeha 2020an li ser Şingalê komplo nû kirin. Bi taybetî bi neqandina 9ê Cotmehê nîşan dan ku dev ji tinekirina Kurdan bernedane.

Dijminiya dewleta Tirkan ya li hemberî Kurdan gihat asteke wisa ku li Rojhilata Navaî aramî û ewlekariyê ji holê rake. Heta ne Rojhilata Navî tenê, ji bo dinyayê tevê Tirkiye bûya çavkaniya xeter û bêaramiyê. Bi komkirina bi dehhezaran çekdarên ji bermayiyên DAIŞê û El Nusra hem gefê li Sûriyê dixwe hem tevayiya dewletên erebî. Van çeteyan herwiha li di şerê li Libya û Azerbaycanê de jî bi kar tîne. Bi bikaranîna van çeteyan li Sûriyê herêmên dagîrkirî jî zêde dike. Ewropa jî di navê de terorê li dinyayê belav dike.

Gelên Sûriyê berdêlên giran dan. Êdî mirov ji şer westiyan. Niha li Sûriyê dema dema çareserî û aştiyê ye.

Lê dewleta tirkî bi êrişa ser herêmên weke Efrîn û Serê Kaniyê bû sedema wêraniyên nû û koçberiyê. Niha jî dixwaze bi desteka Amerîka û Rûsya li pey êriş û dagîrkirinên nû ye. Dibêje çi dibe bil bibe divê habûn û statûya Kurdan çênebe. Ji bo wê wê şer dirêj bibe, wê wêraniyên nû çêbên ji bo wê ne der de. Li aliyê din di êrişa ser başûrê Kurdistanê de jî sînoran nas nake. Bênavber çekên kîmyayî bi kar tîne. Ji ber destek û çavgirtina Amerîka û Ewropa ti qanûnan nas nake. Niha jî destê xwe avêtiye pêsîra Amerîka, dibêje tu çawa YPGê naxî lîsteya terorê. PKK û YPG yek in. Çawa we li hemberî DAIŞê şer kir divê hên li hemberî PKK û YPGê jî şer bikin. Amerîka bi piştgirî û hevkariya terorê sûcdar dike. Ya ku wiha pêşiya dewleta tirkî vekirî Amerîka bixwe ye. Li hemberî PKKê û Kurdan bi dehê salan destek da fîşîzma tirkî. Bi neheqî berxwedana Kurdan û PKK bi terorîzmê bi nav kirin. Faşîzma tirkî jî ev bi kar anî. Niha ji ber ku Amerîka li hemberî DAIŞê li Sûriyê bi Kurdan re dixebite faşîstên Tirkan har bûne. Li gorî wan divê li dinyayê ti kes silavê nede Kurdan û hebûna wan qebûl neke. Ev dijminî wan dixe riyên derveyî aqil. Dewleta tirkî, Amarîka ku çil sal in li hemberî PKKê destekê didiyê bi piştgiriya terorê sûcdar dike.

Amerîka her tim digot YPG û PKK ji hev cuda ne, em li hemberî terorê ne. Texmîn dikirin ku wê bi wî awayî nijadperestên Tirkan nerm bikin. Ji ber wê dewleta tirkî jî dagîrkirina Sûriyê jî di navê de her tim daxwazî jê kirin. Heman tişt li hemberî Rûsya jî kir. Di encamê de îro beşeke girîng ji erdê Sûriyê di binê dagîrkeriya tirkî de ye. Û Tirkiye li pêşiya aştiya li Sûriyê astenga herî mezin e. Eger Tirkiye ji navberê bê derxistin wê li Sûriyê çareserî hêsan bibe. Lewra Amerîka ne mayînde ye. Niyeteke wê ya dagîrkirinê nîne. Gelên bakur-rojhilatê Sûriyê, rêveberiyên xweser û Kurd yekîtiya Sûriyê û erdê wê diparêzin. Amade ne ku bi rêveberiya Şamê de li hev bikin û pirsgirêkan bi demokrasiyê çareser bikin. Ji bo wê ji Amerîka û Rûsya destekê dixwazin. Rêveberiyên xweser nahizirin ku rejimê ji holê rakin yan jî herêmên nû bixin destê xwe. Ev ji bo Sûriyê tecrûbe û dewlemendî ye. Biden got, dewleta tirkî zererê dide têkoşîna li hemberî DAIŞê. Herwiha zererê dide sivîlan û polîtîkaya Amerîka û berjewendiyên wê û aramiyê xerab dike. Ev helwest û daxuyanî girîng in. Divê em gazî Amerîka û Rûsya bikin. Divê tevayiya rewşenbîrên dinyayê, derdorên demokrat û partî tevlî vê bibin.

Dema Tirkiye dikeve tengiyê dibêje me li Sûriyê li hemberî DAIŞê şerekî mezin kiriye û hêzên koalisyonê sûcdar dike. Rêveberiya Erdogan ka çawa bi DAIŞê re tev digeriya û bi dehhezaran milîtanên wê di ser Tirkiyê re derbasî Sûriyê dikirin, ji her kesî pirtir Amerîka û Rûsya dizanin. Niha jî DAIŞ û yên weke wê li deverên di binê dagîrkeriya Tirkiyê de di ewlekarî û aramiyê de xwe bi rêxistin dikin. Li Idlibê bi awayekî eşkere di binê parastina Tirkiyê de ne. Divê Amerîka û Rûsya li hemberî mirovayiyê û gelên xwe durist û vekirî tev bigerin. Divê dev ji veşartina sûc û belgeyên dagîrkerên faşîst berdin. Eger dixwazin li Rojhilata Navî aştî pêk were divê planên Tirkiyê bên xerabkirin û pêşiya xerabiyên wê were girtin. Komployên wê yên 9ê Cotmehê û dagîrkeriya wê enceq bi vê pêkan be.